# Koordînasyona piştevaniyê hat avakirin

Ji bo tercîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin hevseroka KCD'ê Leyla Guven 52 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Her wiha li girtîgehan 64 girtî bi heman armancê di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Li aliyê din li bajarê Strasboûrg yê Fransayê komek çalakger 13 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne.



ÎHD, TÎHV, ÇHD, OHP û Komîsyona Girtîgehan a Baroya Enqereyê jî têkildarî çalakiya greva birçîbûnê daxuyanî dan çapemeniyê. Di daxuyaniyê de hat gotin ku her ku diçe çalakiyên greva birçîbûnê zêde dibin û li dijî binpêkirina mafan wan wek ÎHD, TÎHV, OHP, ÇHD, komsîsyonên mafan û girtîgehan ên baroyan û rêxistinên tenduristiyê kordînasyonek ava kirine û dê têkildarî mijarê raporan amade bikin... R.3

GREVA BIRÇÎBÛNÊ DI ROJA 52'EMÎN DE YE


@rojname

29 Kanûn - Şemî 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 219


## Daxuyaniya Trump

Rojhilata Navîn a ku Şerê Cîhanê yê Sêyemîn lê heye, piştî daxuyaniya DYA'yê ya 'vekişandina leşkeran' bû sedema pirsa 'ew ê ji vê pê ve çi bibe' û li ser dibêtiyên (îhtimal) cuda pêşiya nîqaşan vekir. Tew ji niha ve wek ku pêk hatine û rast in, li ser hin dibêtiyan tê axaftin û bendewariyên hin kesan jî çêbûne... Nivîsa Cûmalî Dogan / RÛPEL - 3

# Êşa giran hêrsa mezin





### MALBATAN REŞ GIRÊDAN

Dewleta tirk di êvara 28'ê kanûna 2011'an de li gundê Roboskê yê Qilebana Şirnexê piranî jê zarok bi giştî 34 gundî bi balafirên şer qetil kirin. Bi boneya salvegera komkujiya Roboskê di serî de li gundê Roboskê, gelek bajaran bîranînê hatin lidarxistin. Malbatan cilên reş li xwe kirin, wêneyên xizmên xwe hildan û berê xwe dan goristanê. Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan û wekîl jî tev li merasîma bîranînê bûn.

### QÊRÎN LI ROBOSKÊ OLAN DIDE

Li ser navê malbatan Velî Encu daxuyanî da û diyar kir ku hiqûqa dewleta tirk û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê komkujiya bincil dikin û ji hiqûqnas û siyasetmedarên berpirsiyariya wan di dosyaya dozê de heye xwest rexnedayîna xwe bidin. Elçî da zanîn ku qêrîna wan tenê li çiyayên Roboskê olan dide û wiha got: "Dengê me ji bilî gund dernakeve. Olana dengê me xwe dizivirîne û li rûyê me dikeve."

### QATIL DIYAR IN

Pervîn Buldan got komkujî bi zanebûn hatiye kirin û berpirs bi teqezî wê hesab bidin. Buldan her wiha li ser rexneyên malbatan jî got: ''Rexneyên malbatê li ser seran û ser çavan in." Buldan diyar kir ku qatilên komkujiya Roboskê diyar in û wiha axivî: "Berpirs û kujer diyar in. Ev doz çima dikeve û tê redkirin? Em soz didin malbatan wê Komkujiya Roboskê di tariyê de nemîne."... RÛPEL - 3



## YPG'ê ji bo Minbicê bang li rejîmê kir

**Tirkiye dixwaze bi alîkariya çeteyan Minbicê dagir bike. YPG'ê li dijî dagirkeriyê hemleyeke nû pêk anî**

Fermandariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku wan şerê terorê kiriye û îro jî dewleta tirk a dagirker gefê li wan dixwe. Fermandariyê bi daxuyaniyekê bang li hêzên dewleta Sûriyeyê kir ku li dijî gefên dewleta tirk parastina herêma sînorê Minbicê bikin. Desteya Niştimanî ya Erebî lihevkirina di navbera YPG`ê û hêzên dewleta Sûriyeyê de wek pêngaveke girîng pênase kir û got armanc pêşîlêgirtina dagirkeriyê ye... R.3

## Tirkiye ji bo destûrê bigire diçe Rûsyayê


Ji Tirkiyeyê heyetek diçe Rûsyayê û ji bo dagirkirina bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji Rûsyayê bixwaze ku ji balafirên artêşa tirk qada hewayî veke. Li hemberî vê yekê hevdîtinên rêveberiya bakur û rojhilatê Sûriyeyê jî bi Rûsyayê re didomin... RÛPEL - 4

## Ciwanan yekitiya xwe ragihand

Li Qamişloyê endamên 17 partî û 5 rêxistinên ciwanan yekitiya xwe ragihand. Ciwanan got ku ji bo komkujiyên li ser kurdan dubare nebin yekitiya xwe ava kirine û her wiha ciwanan li dijî dagirkeriyê meşek li dar xist.

## Stûnên dîrokî di avahiyên nû de bi kar tînin

Dewleta tirk li Surê 6 tax rûxandin û gelek avahiyên dîrokî hilweşandin. Ji bo çêkirina dikanên li Kuçeya Yenîkapiyê, di kolandina hin deveran de hin stûn derketin holê. Ev stûn û serikên wan di çêkirina avahiyên nû de tên bikaranîn. Arkeolog diyar dikin ku kevirên dîrokî yên li vê kuçeya di dema Romayê de Agora (çarşî) bû hatin derxistin aîdê serdema romayê ne.



## Dixwazin ji kurdan tu şop nemîne



Rektorê Zanîngeha Artûklûyê Prof. Dr. Ahmet Agirakça di wergera xwe ya pirtûka dîroka îslamê ya El-Kamîl fî't-Tarîh de beşên tê de "kurd" dinivîsandin wekî "tirk" guherandin... RÛPEL - 6


**Serlêdana** jinan veguherî **çalakiyeke rengîn** R2

R 3 Li hemamê ji ber bi kurdî **axivî hat derbkirin**



www.arsivakurdi.org



## Jinên Edeneyê ji jinên girtî re qertên sersalê şandin

**EDENE -** Meclisa Jinan a HDP'ê ya Edeneyê bi boneya sersalê bi armanca piştevaniya jinên li girtîgehên cuda tên ragirtin qertên sersalê şandin. Jinan beriya şandina qertan daxuyaniyek da û destnîşan kir ku bi hezaran hevalên wan bi awayekî bêhiqûq hatine girtin û ji bo piştevaniya jinên girtî qertên sersalê dişînin. Jinan bal kişand ser çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a Leyla Guven li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin û wiha gotin: "Divê tecrîd bê rakirin. Daxwaza me jinan û hemû civakê ev e." Piştî daxuyaniyê jin derbasî hundirê PTT'ê bûn û qert şandin.

# Serlêdana jinan ji bo destkeftiyan e

Aktîvîsta TJA'yê Ayşe Gokkan der barê serlêdana jinan a ji bo hilbjartina herêmî de axivî û diyar kir ku serlêdana jinan veguheriye çalakiyeke rengîn û wiha got: "Jinên serlêdan kirine li dijî desteserkirina destkeftiyan bertekên xwe wiha nîşan dane."

Tevgera Jinên Azad (TJA) jî di xebatên hilbijartina herêmî de roleke çalak dide ser milê xwe û di heman demê de li dijî zextên li ser jinan di nav têkoşînek bêwestan de ye. Aktîvîsta TJA'yê Ayşe Gokkan der barê hilbijartina herêmî de axivî û diyar kir ku wan bi rêxistinên pîşeyî, komên baweriyan û tevgerên civakî yên cuda re civînên herêmî li dar xistine û xwestine bi van civînan hevkarî û piştevaniya hev bikin.

Gokkan da zanîn ku dê di rojên pêş de li herêmê hîn bêhtir bi gel re bên gel hev û wiha domand: "Me bi hemû sazî û dezgehên jinan re hevdîtin pêk anîn û ji bo serdema nû plansaziyek nû derxist. Di rojên pêş de em ê wek jinan li taxan û her deverî belav bibin û dest bi xebatên rêxistinbûyînê bikin. Em ê hîn bêhtir bi jinan re bên gel hev. Em ê ji nû ve partiya jinan zindî bikin û birêxistin bikin."

Di axaftina xwe de Gokkan anî ziman ku pêkanînên faşîzane bi rejîma pergala nû re ji her demê bêhtir giran bûne û wiha got: "Em ê li dijî her cureyên êrîş û zextan li ber xwe bidin û têkoşîna xwe mezintir bikin."



Gokkan destnîşan kir ku serlêdana bi sedan jinan a ji bo hilbijartina herêmî veguheriye çalakiyek rengîntirîn û wiha pê de çû: "Jinên serlêdan kirine ne ji bo şertên wan bên qebûlkirin, li dijî desteserkirinê û dagirkirina hemû tiştî serlêdan kirine û bertekа xwe wiha nîşan dane. Yanî vê yekê wek çalakiyekê qebûl dike û bi vî awayî serlêdana xwe dike."

**200 jin hatin binçavkirin**

Di berdewamê de Gokkan diyar kir ku beriya hilbijartina herêmî zextên dewletê bi taybetî li dijî jinan zêde bûn û wiha axivî: "Di meha dawî de 200 jin hatin binçavkirin. Li dijî zilmê hem li derve û hem li hundir berxwedanek bêhempa heye. Remza vê berxwedana girîng jî Leyla Guven e. Li dijî tecrîdkirina li Tirkiyeyê tê birêvebirin dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Greva birçîbûnê niha li hemû girtîgehan belav bûye. Li dijî vê berxwedanê êrîş di asta herî jor de ne."

**'Em ê bi hev re ava bikin'**

Di dawiya axaftina xwe de Gokkan anî ziman ku ji bo diyarkirina namzetiya hevşaredariyan amadekariya hilbijartina pêş dikin û bi vê amadekariyê re jî ew beyanname û stratejiya hilbijartinê amade dikin û diyar kir ku yek ji dirûşma wan a girîng a vê hilbijartinê 'Di her şertî de em ê bi hev re ava bikin' e û di vê çarçoveyê de divê jin li her qada jiyanê hebin. *AMED*

## Em li dijî rejîma yekkesî bi hev re têbikoşin

Jin di navbera 5-6'ê çileyê de li Stenbolê di hevdîtina jinan a 'Jin bi hev re xurt in' de bên cem hev. Bi banga Platforma Jinan a İzmîrê (İKP) re femînîstên serbixwe, jinên siyasetmedar û gelek jin li Navenda Çanda Turkan Saylan hatin cem hev. Jinan diyar kir ku li dijî polîtîkayên dijminê jinê yên desthilatdariyê, têkoşîna yekbûyî girîng e û banga hevdîtina tevlêbûna li Stenbolê kirin.

Berdevka Piştevaniya Mor Julîana Gozen diyar kir ku demek direj e li hember jinê êrîş hene û jin jî ji bo li dijî vê bibin bersiv di lêgerînê de bûne û wiha got: "Hîna navê wê tune bû lê rewşek wisa hebû. Di 8'ê Adarê de ji her derê jin daketin qadan û li dijî qirkirina jinan serî hildan. Em niha bang li hemû kesî dikin ku li dijî rejîma yekkesî bibin yek."

**Armanc birêxistinkirin e**

Ji Qada Parastina Jinan a İzmîrê Gîzem Coşkun jî destnîşan kir ku avabûna 'Jin bi hev re xurt in' rêxistinbûna li dijî desthilatdariyê derxistiye holê û wiha domand: "Armanc ev e ku hê bêtir xwe rêxistin bikin. Em difikirin ku hem li herêmê hem li seranserê welat dê bandorek girîng bikin. Jin li dijî xespkirina mafên xwe bi bertek in. Hûn li ku dibin bibin bizanin ku ne tenê ne."

**Êrîş li beden û nasnameya jinan e**

Her wiha berdevka jinan a KESK'ê Dîlek Kanlibaş bal kişand ser têkoşîna yekbûyî ya jinan û wiha axivî: "Hemû polîtîka bi mêjiyê mêran tên meşandin û li ser beden û nasnama jinê tên kirin. Em van hemûyan dizanin. Em dibêjin ku em xwedî li bedena xwe û keda xwe derdikevin, ji bo em êrîşan biçewisînin em ê her tiştî bikin. Em ê bi pêlek mezin a jinan van êrîşan vala derxînin." *İZMÎR*

## Çareseriya li dijî tundiyê fikrên Ocalan e



Komîteya Jinên Başûr a 'Azadî ji bo Rêber Apo' li dijî qirkirina jinan ên li başûrê Kurdistanê li herêma Germiyanê konferansek bi dirûşma 'Na ji bo komkujiyên jinan, belê ji bo çareseriya bingehîn' li dar xist. Konferans bi beşdariya 100 çalakvanên jin pêk hat. Konferans bi deqîqeyek rêzgirtin ji hemû jinên Başûr ên bûne qurbana çanda desthilatdar a mêr Sêwan Qadir, Tirîfe û Sacîde dest pê kir.

Endama komîteya amadekar Sara Reza axaftina vekirinê ya konferansê kir. Sara Reza diyar kir ku tundî civakê fetisandiye û wiha got: "Heya çareseriyeke bingehîn ji bo van pirsgirêkan peyda nebe, dê dawî li tundiyê neyê. Çareserî jî di fikrên birêz Ocalan de heye. Em ê bi helwest û hewldanên pêwîst bigihijin çareseriyê." *KELAR*

## Lidarxistina konferansê bi xwe serkeftinek e

Di 27'ê kanûnê de li Minbicê bi dirûşma 'Jinên birêxistinkirî misogeriya Sûriyeyeke demokratîk in' yekemîn konferansa Meclisa Jinên Minbicê pêk hat.

Jinên ku beşdarî konferansê bûn der barê konferans û gefên dewleta tirk de axivîn û diyar kirin ku li gel gefên dewleta tirk lidarxistina konferansê bi serê xwe serkeftineke û ji dagirkeriyê re jî re berdiveke.

Hevseroka Şaredariya Gel a Minbicê Asya Oso got ku tevlêbûna jinan ji bo hemû qadên şer xwe ispat kirin ku dê dewleta tirk nikaribe vîna wan bişkîne û dê gel bi her awayî axa xwe biparêzin. Li ser heman mijarê hevseroka Komîteya Şaredariyan Nêroz Şihab diyar kir ku pêkhateyên herêmê ereb, kurd, suryan, çerkez û tirkmen dê li hemberî dagirkeriyê bisekinin.

Hevseroka Şirketa Kehrebeyê ya Minbicê Meha Elî konferans li tevahî jinan pîroz kir û ev tişt anî ziman: "Gefên Tirkiyeyê jinên Minbicê natirsîne, ji ber ku jin dikare xwe û welatê xwe biparêze." *MINBIC*





## Meclisê heta niha 98 komun ava kirin


Meclisa Jinan a El Cezerat a girêdayî Dêrazorê ya ku piştî rizgarkirinê di 14'ê mijdarê de hat avakirin heta niha 98 komunên jinan ava kirin û bi sedan dozên girêdayî jinan çareser kirin.

Meclis ji gelek komîteyên wek malî, arşîv, xizmetguzarî û liheva nînê pêk tê. Ji ber ku Meclisa Jinan sîwana bingehîn a tevahiya jinên herêmê ye, meclisê weke erk 98 komunên jinan li El Cezerat, El Kesra, El Bû Şems û El Keber ava kirin û ji bo fêrkirina jinan a xwendin û nivîsandinê, komîteya perwerdeyê çalak kiriye.

**Ji bo pêşketinê xebat tê kirin**

Dema çeteyên DAIŞ'ê herêm dagir kiribû, tundî bi hemû cureyên wê yên derûnî û bedenî li dijî jinan ji kuştin, tecawiz, girtin û firotina wan di sûkan de pêk anîn. Ji ber wê meclisê ji bo rakirina tundiya li ser jinan û naskirina wan bi rola jinan a pêşeng di civakê de, semîner û panelên fikrî ji jinan re organîze dike û belavokên girêdayî mijarê belav dike.

Têkildarî mijarê endama Meclisa Jinan Zehra Tayê tekez kir ku ji bo têkoşîna li dijî tundiyê xebatan dikin. *DÊRAZOR*



## Keçên winda yên ermen ên Dêrikê

**Rojda AYDIN / MÊRDÎN - JINNEWS**

Li Rojhilata Navîn herêma ku di navbera deşta Dîcle û Firatê de dimîne jê re Mezopotamya tê gotin. Mezopotamya wek dergûşa şaristaniyê tê binavkirin. Ji ber axa wê ya dewlemend û avhewaya wê cihê yekem ê çandinî û xwecîhîbûna mirovahiyê ye. Mezopotamya ji destpêka dîrokê ve bûye cihê ku qewmên cuda bi hev re lê jiyane. Vê herêma ku bala tevahiya cîhanê kişandiye ji gelek şaristaniyan re mazûvanî kiriye. Ji bilî şaristaniyan gelên cuda jî li ser vê axê bi hev re jiyane. Ji van gelên yek jê jî gelê ermenî ye.

Piştî ku di 1914'an de Şerê Cîhanê yê 1'emîn hat destpêkirin ji aliyê Osmaniyan ve li dijî ermenan polîtîkayên qirkirin, koçberî û îmhayê hatin destpêkirin û di encamê de bi hezaran ermen hatin qirkirin, ji cih û warên xwe hatin sirgûnkirin û yên mayî jî ku bi rêya revê xwestin xwe rizgar bikin bi gelek zahmetiyên jiyanê re rû bi rû man. Wekî hemû fermanên ku hatine jiyîn di dema qirkirina ermenan de jî herî zêde jin û zarok bi bandor bûn. Dem ku mirov li dîrokê dinêre mirov di dema îro de jî li gelek çîrokên bi êş ên jinên ermen rast tê. Ji van jinan yek jê jî jina bi navê Ena Emîne ango Emîne Yuzel e.

**Ena Emîne kî ye?**

Ena Emîne ji Baybûrtê ye, navê wê yê rastî Ohun e. Di qirkirina ermenan de reviyane hatine li navçeya Çinarê ya Amedê bi cih bûne. Qefleya ku ji komkujiyê xelas bûye li herêma 'Çîpê Reş' a girêdayî Çinarê careke din rastî komkujiyekê tên û ji qefleyê gelek kes tên qetilkirin. Piştî çend rojan leşkerekî kurd bi hespê ji herêmê derbas dibe rastî zarokeke ku di nav tuman de ye tê. Navê wê zarokê Ena an jî Ohun e. Ew leşker kesekî ji wê herêmê ji malbata Davudê Kalo ye. Dema zarokê dibîne hildide û dike bin hîmayeya xwe. Piştre tîne Dêrikê ya Mêrdînê.

Ena dema hîn zarok bûye mêrê bi navê Şeyhmus Yuzal re tê zewicandin. Ew piştre dibe dayika 6 zarokan. Ena ya ku bi temamiya temenê xwe bi ermenî axiviye û kesekê jê re negotiye ku zimanê dayika wê ye. Lê Ena piştî ku fêr dibe ev ziman zimanê dayika wê ye, diçe gel mamosteyekî û dixwaze ku ji Bayburtê hinek axa warê wê jê re bîne. Xwesteka Ena tê bicihanîn. Ena ji axa welatê xwe hinek dide neviyên xwe û ji neviyên xwe re wiha dibêje: "Ger ku ez mirim vê axê li ser gora min bireşînin."

**Bi hesereta warê xwe mir**

Ena piştî ku weyseta xwe dike axa di destê xwe de dike nav avê û vedixwe. Ena bi hesreta warê xwe di sala 1996'an de jiyana xwe ji dest dide. Dema jiyana xwe ji dest dide neviyên wê wesyeta wê bi cih tînin.

www.arsivakurdi.org

CÛMALÎ DOGAN

# Daxuyaniya Donald Trump

Daxuyaniya der barê biryara 'vekişandina leşkeran' ya serokê DYA'yê Donald Trump hem ket rojeva Rojhilta Navîn hem jî ya cîhanê. Hema bêje kesekê ku li ser vê mijarê nêrîna xwe nanîbe ziman, nirxandin û şîrove nekiribe nema. Ev tişkekî asayî ye jî. Rojhilata Navîn a ku Şerê Cîhanê yê Sêyemîn lê heye, piştî daxuyaniya DYA'yê ya 'vekişandina leşkeran' bû sedema pirsa 'ew ê ji vê pê ve çi bibe' û li ser dibêtiyên (îhtimal) cuda pêşiya niqaşan vekir. Tew ji niha ve wek ku pêk hatine û rast in, li ser hin dibêtiyan tê axaftin û bendewariyên hin kesan jî çêbûn.

Di serî de divê ev rastî bê zanîn ka gelo rastiya hebûna DYA'yê ya li Rojava çi ye û ketina wê ya Rojava di kijan mercan de pêk hat? Ger ev rastî baş neyê zanîn li Rojava bi taybetî ji 2011'an û vir ve tiştên ku hatin jiyîn bi DYA'yê rave bikin, ew ê nêzîkatiyeke pir çewt derkeve holê. Bi giranî jî nirxandinên ku tên kirin jî di vê çavçoveyê de ne. Tu têkiliya vê nêzîkatiyê bi rastiyê re tune ye. Tew ji vê wêdetir hin nirxandinên wek ku li wê derê kurd tunebin û tiştên ku piştî 2011'an pêk hatin bi destê hêzên derve pêk hatin, tên kirin. Ev nirxandin bi çavekî ji jor ve ku hêza gelan nabînin tên kirin ku ev nêzîkatî ji ya mêtinger û zordestan e.

Rol û rista DYA'yê ya di şerê Sûriyeyê de nikare bê înkarkirin. Bûyerên ku piştî 2011'yan hatin jiyîn em bînin bar çavên xwe û lê bifikirin ev rastî dê bi awayekî zelal bê dîtin. DYA bi hêzên li hemberî rejîmê şer dikirin re rasterast di têkiliyê de bû. Hem ji aliyê maddî hem ji aliyê leşkerî ve piştgirî dida wan. Bi vê tenê jî nema, xwest wan hem bike artêş hem jî hêzeke siyasî. Plansaziya 'Perwerde-bi techîzat bike' kir meriyetê, di 'çareseriya' pirsgirêka Sûriyeyê de hêzên ku destek dida wan di qada navneteweyî de wek muhatap ew derxistin pêş û xwest ku bi vî awayî bên pejirandin. Lê bi vê yekê jî encama ku dixwest bi dest nexist. Hetta zor û zehmetiyên pir cidî jiyan.

Li aliyekî DYA'yê di şerê li Sûriyeyê de zor û zehmetiyan dijiya, li aliyê din li Rojava gel serî hilda û li Kobanê, Qamişlo û Efrînê rêveberiyên xwe ragihandin. Gelê Rojava li dijî DAIŞ û hêzên kontra yên Tirkiyeyê ku îroj wek 'Kuvayî Miliye' bi nav dike li ber xwe da û têkoşiya û serkeftin/destkeftiyên girîng bi dest xistin. Wek ku rayedarên DYA'yê jî diyar dikin di pêvajoyeke wiha de bi PYD'ê re têkilî danîn. Bi bexwedana Kobanê re nasîn û têkiliya yekemîn pek hat û ev bi bangawaziya PYD'ê nînbû. Hebûn û mayîna leşkerên DYA'yê ya li Rojava jî bi vî awayî pêk hat.

Ji ber vê ye ku li vê derê tiştê ku teqez divê bê dîtin ev e; li Rojava hemû destkeftiyên heyî bi saya berxwedana hêzên şoreşger, demokrasî û gelê rojavayê Kurdistanê hatin bidestxistin. Ev jî di nav derfetên kêm de bi bawerî, vîn, biryardarî û wêrekiyeke mezin pêk hat. Vê rastiyê kir ku DYA ji vê rewşê ji bo berjewendiyê xwe bibîne.

Tevî vê rastiya li ber çavan nixandin û spekulasyonên li ser vekişîna leşkerên DYA'yê ya ji Rojava tên kirin, bi me dide nîşandan ku ka dixwazin çi bikin. Divê neyê jibîrkirin ku şoreşa Rojava bi desteka DYA'yê pêk nehatiye. Şoreşa Rojava bi pêşengiyeke şoreşger ji aliyê gel ve bi berdêlên mezin hatiye kirin. Tevî ku bangawazî nehat kirin jî DYA demek direj piştî şoreşê hat Rojava. Ji ber vê ye ku heta niha çawa parastine ji vê pê ve jî dê hêzên şoreşger, demokrasî û gel bi xwe biparêzin.

Bêguman hêzên koalîsyonê û di nav de jî DYA, di bihêzirina destkeftiyên şoreşa Rojava de roleke wan a girîng hebûye. Leşkerên wan jî jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Divê ev jî neyê înkarkirin. Lê belê divê her tişt jî bi vê neyê ravekirin ku ev nêzîkatî xapînok e. Ger DYA hêzên xwe vekişîne jî dê şoreşa Rojava ji bo pêşvebirin û parastin xwe û deskeftiyên têkoşîna xwe berdewam bike. Divê tu gumana kesê ji vê tune be.

Donald Tump got ku dê 'lêşkerên xwe vekişînin'. Rastî jî dê ev pêk were? Piştî ku leşkerên xwe vekişînin ew ê bêje 'ji me evqas' û hemû têkiliyên xwe yên bi Rojava re qut bike? An jî dê bikevin lêgerîneke ku bi şoreşa Rojava re têkiliyên cuda bimeşîne? Bêguman vê biryarê ew ê bi xwe bidin.

# 34 qurbanî hatin bibîranîn

**Bi tevlêbûna malbatên qurbaniyan, parlamenterên HDP'ê û gelek parêzvanên mafên mirovan, kesên di Komkujiya Roboskê de hatin kuştin bi merasîmekê hatin bibîranîn. Di merasîmê de bang li dewletê hat kirin ku kesên fermana komkujiyê dan, bên darizandin**

Hêzên artêşa tirk di 28'ê kanûna sala 2011'an de û 19 jê zarok, 34 welatiyên ji gundê Roboskê yê Qileban a Şirnexê bi balafirên şer qetil kir. Bi boneya 7'emîn salvegera Komkujiya Roboskê, bi tevlêbûna hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan, parlamenterên HDP'ê, parêzvanên mafên mirovan, parêzvanên buroyan, malbatên Roboskê û gelek welatiyan li ser gorên qurbaniyan merasîma bîranînê hat lidarxistin.

Di bîranînê de li ser navê malbatên qurbaniyan Velî Encu daxuyanî xwend û destnîşan kir ku li gel ku bi awayekî zelal tê zanîn ka kê fermana komkujiyê daye û kê pêk aniye jî, der barê van kesan tiştek nehatiye kirin. Encu diyar kir ku bi hinceta ku rêyên hiqûqa navxweyî neqediyane, dosyaya dozê ji hêla DMME'yê ve hatiye redkirin û da zanîn ku dosyaya dozê ji hêla dadgehê ve bi helwesteke siyasî hatiye pakkirin.

**Beştaş û Elçî rexne kirin**

Encu di berdewamê de jî parlamentera HDP'ê ya Sêrtê Meral Daniş Beştaş û serokê Baroya Şirnexê Nuşîrevan Elçî rexne kir û wiha domand: "Meral Daniş Beştaş li ser mijara ku wê doz çawa were birêvebirin malbat qanih kirin. Li ser navê partiyê barê siyasî daye ser xwe û Elçî ku belge di dema xwe de nedaye, divê pêşî li ber roboskêyiyan, li ber hemû gelê kurd rexnedayîna xwe bidin. Divê hesabê bidin lê çi seyr e ku van du mirovan heta niha rexneyeke nedane."

**Pêşniyara konferansê kir**

Di berdewamê de jî Encu got ji bo ku rêyên ditîr ên vekirina dosyayê werin vekirin, divê konferansek were amadekirin û wiha derbirî: "Baroyên Kurdistanê, rêxistinên mafê mirovan, parêzerên mafên mirovan û rêxistinên civaka sivîl bila konferansekê li dar bixin. Ev konferans bila pêvajoya Roboskiyê bi berfirehî û bi zelalî niqaş bike. Bila ev konferans bang li Beştaş û Elçî bike û bike ku rexnedayîna xwe bidin. Em jî zanibin bê ka çi kêmasî li ku derê hatiye kirin."

**Dê malbat tu carî tenê nemînin**

Di bîranînê de Pervîn Buldan jî got ku komkujî bi zanebûn hatiye kirin û berpirs dê teqez hesabê bidin. Buldan li ser rexneyên malbatan jî ev tişt gotin: "Rexneyên malbatê li ser seran û ser çavan. Heke kêmasiya me ya partiyê hebe, ji holê rakirina vê kêmasiyê peywira me ya herî mezin e. Ji bo kêmasiya ku li para me dikeve, ez rexnedayîna xwe didim. Lê bila malbat bizanibin ku tu caran bi tenê nebûn û dê nebin jî." *ŞIRNEX*






## Bi kurdî axivî û telak bi lûfik ew derb kir

Bêtehemuliya li hemberî zimanê kurdî her diçe zêdetir dibe.

Li navçeya Gaziosmanpaşa ya Stenbolê birayên Sînan û Nazarhan Encu çûn hemamekê. Lê belê ji ber bi kurdî axivîne telak ew hişka lûf kirine û di canê wan de birîn çêbûye. Li gorî îdiayan; birayên Encu di 10'ê kanûnê de piştî serşûştinê ji bo lûfkirinê çûn beşa xizneyê. Wexta her du birayan bi hev re bi kurdî diaxivî telak hatiye û dest bi lûfkirinê kiriye. Di dema lûfkirinê de Sînan Encu hîs kir ku canê wî dişewite û ev yek ji telak jî re gotiye. Piştî lûfkirinê Encu çû cihê cillixwekirinê birayê wî Nazarhan reşayiya li pişta wî dît.

Li ser vê Encu pişta xwe nîşanî xwediyê hemamê da û giliyê wan kir. Lê belê piştî encam nehat girtin vê carê Encu çû Nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê ya Gaziosmanpaşayê û rapora derbkirinê girt. Paşê Encu bi parêzerê xwe re tevî rapora xwe çû Serdozgeriya Komarê ya Gazîaosmanpaşayê û giliyê hemamê kir. Li ser vê dozgeriyê bi îdiaya 'birîndarkirina bi zanebûn' der barê xebatkarê hemamê yê bi navê Şukru lêpirsîn da destpêkirin.

Hêjayî gotinê ye herî dawî li Sakaryayê bav Kadir Sakçi û kurê wî Burhan Sakçi ji ber axaftina kurdî rastî êrîşa komeke nijadperest hatin û bav Sakçi hat qetilkirin. *STENBOL*

## 'Bila berpirsên komkujiyê bên cezakirin'

Bi boneya 7'emîn salvegera qetilkirina 34 welatiyên Roboskêyê li Amed, Mêrdîn, Riha, Şirnex, Êlih, Sêrt, Meletî, Çewlik,Mûş, Bedlîs, Agirî, Colemêrg, Edene, Mêrsîn, Hatay, Dêrsim û Îzmîr û gelek bajarên din jî bi daxuyaniyeke hevpar Komkujiya Roboskê şermezar kirin û qurbaniyên komkujiyê jî bibîranîn. Di daxuyaniyan de hat gotin tevî ku kesên ku fermana komkujiyê dan û yên ku pêk anîn diyar in jî, der barê wan de heta niha tu doz nehatine destpêkirin. Di daxuyaniyan de hat destnîşankirin ku heta failên vê komkujiyê tên darizandin dê têkoşîna xwe bidomînin û hat gotin ku dê şêniyên komkujiyan bêcezahiştina kiryarên wê ye.

Ji aliyê din ve Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) jî bi daxuyaniyeke nivîskî komkujî şermezar kir. KCD'ê diyar kir ku çi dibe bila bibe dê failên vê komkujiyê li pêşberî edaletê hesabê bidin û bang li malbatên qurbaniyan û gelê kurd kir ku xwedî li çalakiyên bîranînê derkevin. *AMED*

## Koordînasyona grevên birçîbûnê ava bû

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorverger ku hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji bo rakirna tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, ket roja 52'yan.

Komeleya Mafên Mirova (ÎHD), TÎHV, ÇHD a bi KHK'ê hat girtin, OHP û Komîsyona Girtîgehan a Baroya Enqereyê jî têkildarî çalakiya greva birçîbûnê civîna çapemeniyê li dar xist. Di civînê de hevserokê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan da zanîn ku piştî Guven her ku diçe çalakî zêde dibin û li dijî binpêkirina mafan wan kordînasyonek ava kirine û diyar kir ku dê koordînasyon geşedanên der barê girtîgehan de bişopîne û raporan amade bike.

Her wiha çalakiyên greva birçîbûnê ku li welat û derveyî welat hatine destpêkirin jî didomin.

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger ku roja 17'ê kanûnê li Strasboûrgê yê Fransayê hatiye destpêkirin didome.

Ji aliyê din ve çalakiya ku şêniyên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) bi heman armancî dane destpêkirin di roja 15'emîn de, çalakiya ku ji aliyê Nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê hatiye destpêkirin di roja 39'emîn de û çalakiya ku ji aliyê Komeleya Karkerên Mezopotamya ya Silêmaniyê hatiye destpêkirin jî di roja 15'an de didome. *AMED*



## Li dijî dagirkeriyê ciwanan yekitiya xwe ragihand

Koordînasyona Ciwanên Kurd li bajarê Qamişloyê li dijî gefên dewleta tirk ên li ser bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi 17 partî û 5 rêxistinên ciwanan re yekitiya xwe ragihand û gotin ku dê şêniyên herêmê bi yekitiyê dagirkeriyê parçekirin. Ciwanan piştî ragihandina yekitiyê bi dirûşmeya 'Ji bo komkujiyên li ser gelê kurd dubare nebin û ji bo netewe û kurdayetiya me' meşiyan.

Her wiha çalakiya Mertalê Zindî ya Serêkaniyê ku li ser sînor li dijî gefên dagirkeriya dewleta tirk dane destpêkirin ev 11 roj in didomin. Şêniyên ku tev li çalakiyê bûne, anîn ziman ku hedef hevgirtina gelê herêmê ye û gotin ku dê heta dawiyê li dijî dagirkeriyê axa xwe biparêzin. *QAMIŞLO*




## Artêşa rejîmê li ser sînorê Minbicê bi cih bû

Fermandariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bi daxuyaniyekê diyar kir ku hêzên wan xwe ji Minbicê vekişandine û hêzên xwe li eniyên şerê li dijî terora DAIŞ'ê bi cih kirine. Di daxuyaniya fermandariyê de hat diyarkirin ku wan şerê terorê kirine û îro jî dewleta tirk gefê li wan dixwe û wiha hat gotin: "Ji ber gefxwarinên dewleta tirk a dagirker ên ji bo dagirkirina herêma bakurê Sûriyeyê û koçberkirina gelê wê ku bi heman awayî li Cerablus, Ezaz, Bab û Efrînê kir, em weke Yekîneyên Parastina Gel diyar dikin piştî ku me hêzên xwe ji Minbicê vekişand, me hêzên xwe hemû di şerê li dijî DAIŞ'ê yê li herêma rojhilatê Firatê de bi cih kirin. Lewra em bang li hikûmeta Sûriyeyê dikin ku em jî beşek ji ax, netewe û sînorên wê ne da ku hêzên xwe ji bo kontrolkirina van cihan û herêma Minbicê bişîne û herêmê li dijî gefên dewleta tirk a dagirker biparêze."

Li ser daxuyaniya YPG'ê, Fermandariya Giştî ya Artêşa Sûriyeyê jî daxuyaniyek da û destnîşan kir ku yekîneyên artêşa Sûriyeyê derbasî sînorê herêma Minbicê bûne. *MINBIC*

www.azadiyawelat.org



## Li peravên Fasê bi sedan koçber hatin rizgarkirin

**RABAT** – Koçberbûna ji welatên Afrîkayê ya ber bi welatên Ewropayê ve didome. Li peravên Deryaya Spî yên Fasê 367 penaberên ku dixwestin derbasî Spanyayê bibin, hatin rizgarkirin. Hêzên Deryayî yên Qraliyeta Fasê têkildarî mijarê daxuyaniyek da û ragihand ku piraniya penaberan ji welatên Afrîkayê ne û gelek ji wan jî jin û zarok in. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku di navbera mehên çile û îlonê de 122 şebekeyên ku koçber birine Spanyayê hatin têkbirin û bi saya vê yekê pêşî li derbasbûna 68 hezar penaberên ku xwestine derbasî Spanyayê bibin ve hatiye girtin.

# Ji bo destûra dagirkirinê diçin Rûsyayê

Îro ji Tirkiyeyê heyeteke diçe Rûsyayê û ji bo dagirkirina bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji Rûsyayê bixwaze ku ji balafirên artêşa tirk re qada hewayî veke. Rêveberiya bakurê Sûriyeyê jî hevdîtinan didomîne

**NAVENDA NÛÇEYAN**

Tirkiye piştî biryara vekişîna Amerîkayê ya ji bakur û rojhilatê Sûriyeyê hewldanên xwe yên ji bo dagirkirinê zêde dike û dîplomasiyeke kirêt dimeşîne. Di vê çarçoveyê de dê îro Wezîrê Karên Derve Mewlûd Çavûşoglû, Wezîrê Parastinê Hulusî Akar, Serokê Îstixbaratê Hakan Fîdan û Berdevkê Serokkomariyê Îbrahîm Kalin biçin paytexta Rûsya Moskovê û bi nûnerên payebilind ên Rûsyayê re hevdîtinan bikin.

Li herêmê qada hewayî niha di bin kontrola Amerîkayê de ye. Lê heke Amerîka ji herêmê vekişe dê qada hewayî ya herêmê bikeve bin kontrola Rûsyayê. Ji bo vê yekê di van hevdîtinan de dê rayedarên tirk piştgiriya dagirkirina herêmê ji Rûsyayê bixwazin. Di serî de jî dê ji Rûsyayê bixwazin ku piştî qada hewayî bikeve bin kontrola wan ji bo êrîşên wan ên hewayî qada hewayî ji êrîşên balafirên artêşa tirk re veke.



Beriya dagirkirina Efrînê jî hevdîtinên bi vî rengî di navbera Tirkiye û Rûsyayê de pêk hatibûn û di berdêla firotina gelek çeteyên di bin kontrola xwe de Tirkiyeyê destûra dagirkirina Efrînê ji Rûsyayê girtibû. Heke qada hewayî ya herêmê ku di bin kontrola Rûsyayê de bû nehatina vekirin, dagirkirina Efrînê ya ji aliyê artêşa tirk ve gelekî zehmet bû. Ji ber vê yekê piştî vekirina qada hewayî Tirkiyeyê dest bi êrîşan kiribû.

**Bakurê Sûriyeyê jî hevdîtinan dike**


Li aliyê din li dijî van hewldanên Tirkiyeyê rayedarên bakur û rojhilatê Sûriyeyê jî pêvajoya dîplomasiyê dane destpêkirin. Rêveberê TEV-DEM'ê Aldar Xelîl têkildarî mijarê ji Reutersê re axivî û diyar kir ku ji bo pêşîgirtina dagirkirina Tirkiyeyê serdana paytexta Rûsya Moskov û paytexta Sûriye Şamê kirine û hevdîtin pêk anîne. Xelîl da zanîn ku dê careke din bi Rûsya û Rejîmê re hevdîtinan bikin.

Xelîl destnîşan kir ku di hevdîtinan de ji Moskov û Şamê xwestine ku Şam erkên xwe yên serweriya parastina sînor bi cih bîne û wiha got: "Me bi Rûsyayê re ji bo rejîma Sûriyeyê sînoran biparêze danûstandin kirin. Em dixwazin Moskov ji bo îstiqrarê rola xwe bilîze." Her wiha endamê şanda ku çûbû Moskovê Bedran Jia Kurd jî diyar kir ku ji bo rêgiriya erişa Tirkiyeyê li ser hemû îhtimalan hevdîtinan dikin.

## Dîsa li hev dicivin

**Li aliyê din hat ragihandin ku dê piştî heyeta Tikiyeyê ya ku çû Rûsyayê dê destpêka sala 2019'an de serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn, serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî û serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan jî li ser mijara Sûriyeyê li hev bicivin. Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Mîhaîl Bogdanov têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî da û ragihand ku dê hevdîtin li Rûsyayê pêk werin.**

**Bogdanov têkildarî dema hevdîtinê jî da zanîn ku heke di bernameya serokdewletan de guhertinek pêk neyê dê hevdîtin hefteya destpêkê ya sala nû pêk were. Hevdîtin di çarçoveya hevdîtinên Astanayê de ku ji çileya 2017'an ve tên organîzekirin ve bê lidarxistin. Pûtîn, Rûhanî û Erdogan herî dawî di meha îlonê de li Îranê li ser Sûriyeyê li hev civiyabûn û di civînê de nakokiya li ser Idlibê ya navbera aliyan derketibû pêş.**



# Bîlançoya xwepêşandanên Sûdanê giran dibe



Li Sûdanê bertekên li dijî dîktator Omer Beşîr ê dostê serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan zêde dibin. Li Sûdanê ji 19'ê kanûnê ve paytext Hartûm jî di nav de li 10 bajaran, li dijî zêdebûna bihayê nan xwepêşandan tên lidarxistin. Çalakî veguherîn têkoşîna ji bo têkbirina rejîma dîktator Omer Beşîr ku ji sala 1989'an ve li ser desthilatdariyê ye.

Hikûmeta Sûdanê angaşt dike ku di bûyeran de heta niha 19 kesan jiyana xwe ji dest daye lê Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî beriya 3 rojan ragihandibû ku 37 kesan jiyana xwe ji dest daye. Her wiha dîsa li gorî daneyên fermî di bûyeran de zêdeyî 200 kes jî birîndar bûne.

Tevna Rojnamevaniyê ya Sûdanê ji bo piştgiriya çalakiyan banga greva sê rojan kir. Beriya niha Partiya Komunîst jî ji bo hilweşandina rejîma Omer Beşîr bang kiribû. Ji ber berdewamkirina çalakiyan û mudaxaleya hêzên dîktator Omer Beşîr fikar hene ku hejmara kesên ji aliyê polîsan ve tên kuştin, zêde bibin.

Dîktator Omer Beşîr sala 1989'an bi darbeyê bû desthilatdar û dest ji desthilatdariyê bernade. Ji sala 2010'an ve ji aliyê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ve bi kirina sûcên şer û sûcên li dijî mirovahiyê û qirkirinê tê sûcdarkirin. Beşîr tevî vê yekê jî du caran hatiye hilbijartin. Herî dawî jî hilbijartina 2015'an de bi rêjeya ji sedî 94,5 hate hilbijartin. *HARTOÛM*



## Leşkerên Nîjerê ketin kemîna Boko Haramê

Rêxistina terorîst Boko Haramê li dijî yekîneyeke artêşa Nîjerê kemîn danî û 13 leşkerên Nîjerê kuştin. Saziya Polîsên Nîjerê têkildarî mijarê bi daxuyaniyekê ragihand ku êrîş li ser karwaneke leşkerî dema xwestiye ji bajarê Maiduguriyayê yê parêzgeha Bornayê derbasî bajarê Damaturu yê parêzgeha Yobeyê bibe, pêk hatiye. Li gel ku rayedarên Nîjerê radigihandin ku di êrîşê de 13 leşker hatine kuştin jî çavkaniyên herêmî rayedaran derewandin û ragihandin ku di êrîşê de 18 leşker hatine kuştin. Boko Haram girêdayî El Qaydeyê ye û bi salan e li Nîjerê li dijî gelên sivîl û artêşê êrîşên hovane pêk tîne û jinan direvîne. *NIAMEY*

## Behreyn jî sefaretxaneya xwe çalak kir

Piştî vekişîna Amerîkayê ya ji Sûriyeyê, welatên ereb xwe nêzî rejîma Sûriyeyê dikin. Piştî ku Yekitiya Malnişînên Erebî beriya çend rojan seferatxaneya xwe ya Şamê çalak kir, Wezareta Karên Derve ya Behreynê jî diyar kir ku sefatetxaneyên her du welatan jî çalak dixebitin. Wezaretê di berfirehiya daxuyaniya xwe de da zanîn ku xebatên sefaretxaneyên wan ên li Sûriyeyê berdewam dikin û her wiha sefaretxaneya Sûriyeyê ya li paytexta Behreyn Manamayê jî bi awayekî çalak xebatên xwe didomînin. Erebistana Siûdî jî dabû xuyakirin ku dê seferatxaneya xwe ya li Sûriyeyê veke û çalak bike. Tê payîn ku di rojên pêş de gelek welatên ereb ku ji ber şerê navxweyî têkiliyên xwe yên bi Şamê re qut kiribûn careke din têkiliyên xwe xurt bikin. *MANAMA*

# Dê Îsraîl li pêşiya Filistînê bibe asteng

Wezîrê Karên Derve yê Rêveberiya Xweser a Filistînê Riyad Malîkî ragihandibû ku ji bo bibin endamê tam ê Neteweyên Yekbûyî (NY) dê serî li Konseya Ewlekariyê bidin. Ev hewldana Filistînê dê li qada navneteweyî weke dewlet were wateya naskirina Filistînê. Hate ragihandin ku dê Îsraîl pêşî li vê yekê bigire. Nûnerê Îsraîlê yê Neteweyên Yekbûyî Danny Danon têkildarî mijarê got ku ew amadekariyan dikin ku vê înîsiyatîfa Filistînê bloke bikin.

Danon angaşt kir ku Filistîn komên terorîst finanse dike û rê li ber tundiyê vedike û wiha got: "Tevî vê yekê jî Filistîn hewl dide bibe dewleteke endamê Neteweyên Yekbûyî. Îsraîl jî dê bi delegasyona Amerîkayê re hevkariyê bike û vê însiyatîfê bloke bike." Li gorî dîplomatên welatên endamê NY'ê daxwaza Filistînê ya ji bo endametiyê dê ji aliyê Amerîkayê ve bê blokekirin ku yek ji 5 endamên daîmî yê Konseya Ewlekariyê ye û xwedî erka vetoyê ye.

Tê payîn ku li ser navê Filistînê dê Wezîrê Karên Derve Riyad El Malîkî di nav meha çileyê de ji bo endametiya tam a li nav Neteweyên Yekbûyî serlêdanê bike. Lê belê ji bo serlêdan li civata giştî ya Neteweyên Yekbûyî pêşkêşî dengdanê bê kirin, divê destpêkê ji aliyê Konseya Ewlekariyê ve bê qebûlkirin. *NEW YORK*



## Îranê bertek nîşanî serdana Trump da

Nîqaşên têkildarî serdana serokê Amerîkayê Donald Trump ya ji bo Iraqê didomin. Di vê çarçoveyê de daxuyaniyek balkêş ji aliyê Îranê ve hat dayîn. Berdevkê Wezareta Karên Derve ya Îranê Behram Kasimî bertek nîşanî serdana Trump da û angaşt kir ku serdana Trump li derveyî şertên dîplomasiyê pêk hatiye. Kasimî da zanîn ku serdana Trump piştî mudaxaleyên leşkerî û mesrefa bi milyonan bi awayekî bê kanûnî serdana baregeha leşkerî ya Amerîkayê kiriye û wiha got: "Trump di bin ewlehiyeke mezin de ketiye axa Iraqê û ev yek li Iraqê bûye sedema muxalefeta gelê Iraqê." Trump roja çarşemê bêyî agahî bide hikûmeta Iraqê bi awayekî surprîz serdana baregeha Amerîkayê Aynu'l Esad a li bajarê Enbarê yê Iraqê kiribû û bi leşkerên Amerîkayê yên Iraqê re hevdîtinek pêk anîbû. *TEHRAN*

www.arsivakurdi.org




## Kobanê de felaketê laserî

**KOBANÊ -** Bajarê Kobanê yê Rojawanî de varayîşê şilîye ra dima xeylî cayê bajarî binê laseran de mendê. Bajarê Kobanê yê Rojawanî de di rojî yo varano bitesîrî dewam keno. Varayîşê şilîye ra laserî wiriştî. Rojawanê bajarî de mehlaya Botanî binê laseran de mende.Lasaran tewr zaf zî bajarekê Şeranî ser tesîr kerd. Sera 60 yê bajarekî binê laseran de mend. Xeylî keye û cayê gureyî binê awe de mendî.Pirdê rayîrê Cerablusî xesar dî û rayîr temamî de qefilya.Kobanê de emser riyê laseran ra 5 kesî merdîbî.

# Encu: Ma do edalet bica bîyarê

Ferhat Encuyo ke bombardûmanê teyareyanê şerî yê dewleta tirkî de bira û 33 merdimê xo vîndî kerdbî da zanayene ke ê do cigêrayîşê edeletî bidomnê û edalet korkuçe de bibo zî do bica bîyarê û va





28ê Kanûne ya 2011î de dewa Roboskî ya pabesteya qezaya Qilêbanî ya Şirnexî de netîceyê bombardûmanê teyareyanê şerî yê dewleta tirkî de 19ê înan doman pêro pîya 34 kesî amebî qetilkerdene. Qirkerdişê Roboskî 7 serrî xo ya dima verdayî û heme xebatê huqûqî yê vînayîşê kiştoxan bênetîce mendî. Bi mehneya ke avûkan evrakê kêmî erşawitî Mehkemeya Qanûno Bingeyî (AYM) û Mehkemeya Heqê Merdiman ya Ewropa (MHME) qerarê AYMyî yê vera merdimanê Roboskîyijan qebûl kerd.

Ferhat Encu yo ke qirkerdiş de bira û 33 merdimê xo vîndî kerdî serra 7. ya Roboskî û qerarê MHMEyî ser o qisey kerd.

Encuyî vist vîrî ke înan sey keyeyê Roboskî nê 7 serran de her qêde zext û hêrişî dîyê û va: “Ma wazenê ke berpirsîyarê sîyasî û eskerî yê nê qirkerdişî bêrî vînayene. Seba mucadeleyê ma yê caardişê edeletî hêrişê ma kenê. Xora nimûneya tewr eşkera ya naye zî dosya ameye şawitene bi mehkemaya eskerî.”

**Wazenê Roboskî bidê vîrakerdene**

Encuyî wina dewam kerd: “Ma nê qirkerdişî de zafê qicî 34 merdimê xo vîndî kerdî. Qirkerdiş ra dima ma Erdoganî ya pîya xeylî sermîyananê hukmatî de pêdîyayîş viraştî. Rixmo ke ma heme raştîye nînan ra vatî, înan goşnêda ma û nêeşnawitişî ra ameyî. Bi vatişanê ‘Her kurtaj Qilebanêk o’ û ‘ma vatene qey ê terorîst ê’ herinda kiştoxan de ê ke ameyî kiştene ameyî sucdarkerdene. Hukmat seba ke Roboskî bide vîrakerdene çike dest ra yeno keno. Wendekarê ke tewrê merasîmê vîrardişê Qirkerdişê Roboskî bîyî ameyî tewqîfkerdene. Niştox û rojnamegerê ke seba vînayîşê kiştoxan veng danê, binê zextî de yê. Bi zext û hêrişan wazenê ke vengê ma bibernê.”

**Merdimê Roboskî do efû mekerê**

Encuyî derheqê qerarê MHMEyî de zî nê vatî: “Senî ke dewlete berpirsîyarê qirkerdişî ya, berpirsîyarê qerarê MHMEyî zî avûkat ê. Xora AYMyî heta ewro dosyayanê sey Roboskî de çirey qeraro raşt nêdayo. La avûkatanê dosyaya Qirkerdişê Roboskî çi heyfo ke qerarê vera ma sinîya zerrêne de AYMyî rê teqdîm kerd. Merdimê Roboskî do çirey Baroya Şirnexî û avûkatanê înan efû mekerê.”

**Mucadeleyê ma do dewam bikero**

Encuyî qiseykerdişê xo wina qedîna: “Ewro ma di hetî ra mucadele kenî. Hem hetê huqûqî ra hem bi qirkerdişî ma bîyî mexdûr la do mucadeleyê ma dewam bikero. Rixme qerarê MHMEyî û îxmalê avûkatan edalet korkuçe de bi zî ma do ê bica bîyarê. Ma heme pawitoxanê heqê merdiman û huqûqkaran ra wazenê ke seba dewaya ma wa paştî bidê û ê ke edaletî ra ûmîdê xo nêbirnayo wa ewro goristanê Roboskî de tewrê vîrardişê serrgêra 7. ya qirkerdişî bibê.” ***AMED***

## Roje esta tena heqê nan vejîyena



Qezaya Karşiyaka ya Îzmîrî de Ahmet Uysalo ke çimê ci nêvînenî tewrê cinîya xo Emîne Uysale bi hawayo seyyar zeytun, rûnê zeytun û sewbîna çîyan roşeno û debara xo keno. Uysalo ke 35 serrî xeylê cayanê cîya cîyayan de xebetîyayo dîyar kerd ke cinîya ci zî linganê xo vera nêeşkena bêhetkarî rayîr şêra û bi daran wirzena. Uysal ard ziwan ke amelîyatêko şaş vera çimanê xo ra bîyo û çimêk yê kênaya ci zî çin o. Uysalî dîyar kerd ke roje esta tena heqê nanê înan vejîyena.

Uysalî qiseykerdişê xo de wina va: “Ma saet 12ê nîmrojîde yenî û heta 5ê şewe tîya yî. Ma dingê ÎZBANî de vindenî û hewl danî ke bi keda xo debara xo bikerî. Seba ke ez kênaya xo bida wendiş, ez her tewir gure de xebetîyaya. Ez katarak vera şîya nêweşxane, la wexto ke ez agêraya keye çimê mi qet nêvînayî. Heme çî zaf vaye bîyo. Seba ke ez muhtacê kesêk nêba no gure kena.” ***ÎZMÎR***

## Grevê vêşanîye roja xo ya 13. de yo

Grevê vêşanîyê yê vera tecrîdê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ke Strasbourgî de yeno viraştene roja 13. de yo. Zîyaretkarê çalakwanan her roje zafêr benî. Çalakîya de 27ê Kanûne de bi eşkerayîya çapemenîye dest pêkerd û xeylî temsîlkarê dezgeyan û parlamentera HDPyî Dîlek Ocalane zî tede 15 kesî tewrê ci benî, ci rê eleqedarîya girde esta. Roja verêne ra her roje bi seyan kesan çalakwanî zîyaret kerdî.

Bi sebebo ke heme muracatê pêdîyayîşî yê avûkatan û merdimanê Ocalanî yenî redkerdene. Çalakwanê grevê vêşanîye bi çalakîya xo vanê ke CPT ganî rolê xo bica bîyaro, veng bido vengê mîlyonan û Birêz Ocalanî zîyaret bikero. Çalakwanan vat ke ma semedê wedartişê tecrîdî û vindarnayişê hêrişanê serê Kurdan dest bi çalakîye kerde û çalakîya ma do heta bicaardişê waştişanê ma dewam bikero. Çalakwanan bi qerardarîya pîle ard ziwan ke ê do bi îradeya girde tecrîd bişinê û ser bikewê. ***STRASBOURG***



## Zindan wijdanê welatan o û wijdan jan veto

Roje çin a ke zindananê Tirkîye û Kurdistanî ra xeberê teda, îşkence, hêriş, derb û sewbînayan nêra. Mustafa Ozgur Mullayî 12ê tebaxe de ame tepiştiş û 13ê tebaxe de zî ame tewqîfkerdiş. Mustafayî erşawitî Zindanê Metrîsî û badê 2 rojan ê erşawitî Zindanê Sîlîvriyê. Mustafa nika hemverê xespkerdişê heq, caardişananê kêfî û zextan de dest bi grevê vêşanîye kerd.

Waya Mustafa Ozgur Mullayî, Esra Mullaye seba birayê xo veng daye û va: “Birayê mi eştişê serê qawişan de raştê îşkence kutişê gardîyanan ameyo. OHALî reyde binpaykerdişê heqan zêde bî. Her roje xeberê cîya cîyayî yenî. Heqê pêvînayîşî zî yeno astengkerdiş. Wexto ke hepsî hemverê binpaykerdişan de vejîyenî raştê cigêrayîşan yenî. 3 cezayê hucre de înfaz yenî veşênayîş. No zî bîyo sey îşkence. Îşkence hemverê şerefê merdiman o û nîno qebulkerdiş. Keye timî hetê hepsîyan de yî. ganî ma veng bidî vengê xo.”

Dayika Mustafa, Hanîfe Mullaye zî qiseykerdişê xo de wina va: “Ganî ma hemverê binpaykerdişan de bi hawayo hîsgerîye têbigêrî. Ez tena seba lajê xo qisey nêkena. Ez seba dayîka heme hepsîyan qisey kena. Ti kesêk îşkence heq nêkeno. Ma wazenê şêrî zindanan û îşkenceyanê hemverê domanan vejî raşte.” ***STENBOL***

## Ma do rayîr nêdî dagirkeran



Seke yeno zanayene çendêk verê Wezaretê Pawitişî yê Amerîka eşkera kerd ke fermanê Sûrîye ra ancîyayîşê leşkeranê Amerîka ameyo îmzakerdene. Serekê Amerîka Donald Trumpî zî dabî zanayene ke ê fermanê ancîyayîşê leşkeranê Amerîka dayî. Dima ra Serekê Pêroyê yê AKPyî Tayyîp Erdogan zî dest bi gef û hêrişan serê Rojawan û Vakurê Sûrîye kerd.


Derheqê tehdîtanê Erdoganî yê serê Rojawan û Vakurê Sûrîye de Şîfa Sewana ke Hesekê ra ya qisey kerde û dîyar kerde ke ê amadeyî heta peynî herra xo bipawî û wina va: “Ma do bi îradeya xo ya azad û bi hêzê xo yê girdî rayîr nêdî dagirkeran.”

Şifaye dewamê qiseykerdişê xo de înan ard ziwan ser: “Erdogan bi gefanê xo heme şarê Sûrîye hedef gêno. Hemverê demokrasîye de şer keno û wazeno sey Efrînî heme Rojawanê Kurdistanî dagir bikero. cinîyê kurd rayîrê azadîye weçînayî û ma do fek têkoşînê xo ra vera nêdî. Ma seba cuyêka bi şeref, bi eşqê azadîye têgêrenî. Seba azadî û demokrasîye xeylê canî feda bîyî. Ma zî amadeyî de seba herra xo û bîyayîşê xo bipawî. Ganî heme dinya hemverê nê gefan de vejîya.” ***HESEKÊ***

## Seydbaz birîndar kerdî o zî derman kerd

Dewa Kalearkasi ya qezaya Mazgirtî ya Dêrsimî de nizdîyê aşmîyêk verê cû Sanîye û mêrdeyê aye Cemal Oktayî herême de pezkovîyek ke seydbazan ci birîndar kerdbî dîyî. Keyeyê Oktayî pezkovîya ke lingê xo yê raşt ra birîndar bibî berd keye.

Keyeyê Oktayî seba pezkovîya birîndar şîyî Mudirîya Daristan û Dorme ya Dêrsimî. Mudirî seba dermankerdişê pezkovîye komêk erşawite. Badê dermankerdişî koma mudirî seba ke pezkovî cuya xo ya xozayî ra dûrî nêkewa aye hetê keyeyê Oktayî de vera daye û şîye. Keyeyê Oktayî zî na qebul kerd û badê ke pezkovî baş biba do aye vera bidî xoza. Cemal Oktayî dîyar kerde ke bawerîya elewîtî de pezkovî pîroz î û cok ra timî înan pawenî. Oktayî tewr peynî reaksîyon nîşanê seydbazan da û waşt ke herême de seyd bêro qedexekerdiş û kesê ke seybazîya pezkovîyan kenî bêrî cezakerdiş. ***DÊRSIM***



# Dixwazin şopên kurdan ji dîrokê bibin

**Rektorê Zanîngeha Artûklûyê Prof. Dr. Ahmet Agirakça di wergera xwe ya pirtûka dîroka îslamê de navên "kurd" bi navê "tirk" guherandin. Zimanzan Zana Farqînî ev mijar nirxand**

**Lezgîn AKDENÎZ / AMED – MA**



Rektorê Zanîngeha Artûklûyê Prof. Dr. Ahmet Agirakça di wergera xwe ya pirtûka dîrokê îslamê ya El-Kamîl fî't-Tarîh a Îbnu'l-Esîr ku di sala 1230-31'ê de li Mûsilê bi erebkî hatiye nivîsandin de beşên tê de "kurd" dinivîsandin wekî "tirk" guherandin. Ev yek ji aliyê seyda û meleyên kurd ên di medreseyan de xwendine de jî hat piştrastkirin.

Her çend ev yek li ser medyaya civakî gelek caran hat nîqaşkirin û di çapemeniyê de derket jî, lê belê Agirakça der barê vê de heta niha tu daxuyanî nedaye. Têkildarî mijarê em li Midûrê Nivîsgehê yê Rektoriya Zanîngeha Artûklûyê geriyan, lê belê hat gotin ku rektor naxwaze der barê pirtûkê de biaxive.


Zimanzan Zana Farqînî li ser vê mijarê anî ziman ku tehrîfata hatiye kirin ne cara ewil e û got: "Koka vê texrîfatê xwe digihîne heta salên dawî yên Osmaniyan. Lê piştî avakirina komarê ev yek veguherî awayekî sîstematîk. Li gorî bîrdoziya fermî di dîrokê de qewmeke bi navê kurd tune ye, zimanê wan tune ye û erdnîgariyeke bi navê Kurdistanê tune ye."

Farqînî bi lêv kir ku di belgeyên dîrokî û belgeyên osmanî de beşên der barê kurdan de pir hatine sansurkirin û got: "Çimkî ev kar bi xemnexuriyeke wisa tê kirin ku, her tişt derketiye holê. Mesela têgîna Kurdistanê ya di fermana ku Qanûnî Siltan Silêman ji Qralê Fransayê Fransûva re şandiye, Wîlayeta Kurdistanê ya ji aliyê Osmaniyan hatiye avakirin ji wesîqeyên dîrokî hatine derxistin. Ji bo bîrdoziya siyasî û fermî belgeyên dîrokî yên orîjînal hatine tehrîfkirin."

**Gelek pirtûk hatin tehrîfkirin**

Farqînî destnîşan kir ku li Tirkiyeyê piştî netewparêzan oldar jî ketine nav hewldanan tehrîfkirina tiştên der barê kurdan de û got: "Hîn vê tehrîfatê dikin tenê ne netewparêz an jî netewperest in, kesên ji xwe re dibêjin oldar jî vê yekê dikin. Mesela, aqûbeta berhemên Seîdê Kurdî, Elî Şerîatî jî heman tişt e. Heta di ansîklopediya îslamê de jî beşên der barê kurdan de bi vî awayî hatine tehrîfkirin. Ji bo vê gelek mînak hene."

Farqînî ji bo tişta hatiye kirin destnîşan kir ku bi vê yekê tê xwestin ku di dîrokê de şopa kurdan paqij bikin û got: "Divê ev tehrîfat û sansur çawa bên nirxandin? Ev yek tê wateya veşartina tiştên der barê kurdan de ne bes e, divê di dîrokê de ji wan tu şop nemîne. Helbet ji bo ravekirina vê rewşê tu hincet tune ne. Ev rewş derî mirovahiyê, derî wijdan, derî etîka zanistê û derî rûmeta mirovan e. Redkirin, înkarkirin, asîmlekirin tu carî nabe çare. Lewre rastî bieqs e, çi zû çi dereng derdikeve holê û wekî lekeyeke reş li ser kiryar datîne. Roj bi heriyê nayê seyandin."



## Ji kundiran hunereke balkêş

Li Dîlokê welatiyê bi navê Îmam Uzun ê 59 salî ku teqawit bûye, hem ji bo debara xwe bike û hem jî j bo hunerê pêş bixe ji kurdirê Mîranî (Kundirê Avî) berhemên awarte û bêhempa çêdike. Uzun ji van kundiran xeml û neqişa lembeyan, abajur, awîze û gelek cureyên amûran çêdike û dixe xemla malan.

Îmam Uzun, hem bê sebra xwe tîne û hem jî bi vê hunerê debara xwe dike. Uzun, piştî teqawit bû bi awayekî profesyonel dest bi vî karî kir. Uzun, diyar kir ku dema mirov li ser hûr bibe û kedê bide hunerên gelek xweşik û bêhempa derdikevin kolê.

Uzun diyar kir ku 10 sal in bi hunera kundirê mîranî re mijûl dibe û wiha got: "Hunera kurdiran pir dîrokî ye. Bi sedan sal in ev huner heye. Kundir hem di xwarinan de tê bikaranîn û hem jî dibe amûreke hunerê. Berê hem dikirin tas û hem jî dikirin meteraya avê. Niha ez hemû hiş û mijûliya xwe didim ser vê hunerê. Hem pê sebra xwe tînim û hem jî pê debara xwe dikim. Niha nêzî 20 xwendekarên min hene. Kî bixwaze fêr bibe ez fêrî wan dikim. Bi qasî ku vê hunerê pêş dixim ew qas jî dema ku ez fêrî şagirtan dikim ez pê şa û kêfxweş dibim. Hem kedê û hem jî hezkirin û sebrê dixwaze. Karekî zor e. Lê xweş e. Hezkirin û sebrê dixwaze. Berî her tiştî sebr jê re lazim e. "

Uzun anî ziman ku hem ji ber ku ji vî karî hez dike pêş dixe û hem jî dixwaze vê hunerê bide jiyandin û her tim zindî bihêle pê mijûl dibe. ***DÎLOK***




# Reng û rûyê Heskîfê winda dikin

**Metîn YOKSU / ÊLIH - MA**

Şûnwarê dirokî û çandî Heskîf ku şopên 12 hezar sal berê yên mirovan û jiyanê lê xuya dibin, rastî wêraniyeke mezin hat. Warê ku navenda turîzmê ye û zêde bala turîstên biyanî dikişîne, îsal ji ber înşaeta lê hat kirin, zinar û şikeftên dîrokî bi dînamîtan hatin hilweşandin û xerakirin reng û ruyê xwe yê dîrokî winda kir. Dîsa gelek berhemên dîrokî yên wekî tirb, mizgeft û dêr ji cihê wan hatin rakirin û guhastin cihekî din.

Warê dîrokî ku sal bi sal di bin avê de dimîne, herî zêde îsal (2018) rûyê wê hat guhertin û talan bû. Her çend ev warê dîrokî û çandî ji aliyê UNESCO'yê ve bê parastin jî heta niha UNESCO li hemberî vê talankirin û wêrankirinê dengê xwe dernexistiye. Bi hinceta hikûmetê serî li Mîrateya Cîhanê nedaye nehat parastin. Bi îhaleyên mezin warên dîrokî ji cihê wan rakirin û birin cihên din. Di nav salekê de cihê Mizgefta Eyyûbî, Hemama Artuklu, Turbeya Zeynelbey, Zeviya Mele Abdullah, Deriyê dîrokî yê Romayê û gelek herhemên din ji cih û warên wan rakirin. Piştî ku ev warên dîrokî ji cihê wan hatin rakirin nayê zanîn ku van berheman çiqas zirar dîtine. Ser keleha Heskîfê bi dîwarê li dora wê tê lêkirin bi betonê tê veşartin. Bi vê talankirin û wêrankirinê re 123 cureyên sewal û zindiyên li Geliyê Dîcleyê dijîn dê tev tune bibin."


**Hîn jî ne dereng e**

Welatiyê Heskîfê yê 66 salî Mehmet Tarhan diyar kir ku nêzî 60 salan li şikeftên di keleha dirokî de jiya û wiha got: "Veguhastina van berhem û warên dîrokî şaş e. Gul di şaxa xwe de xweşik e. Ger ku hat qurmiçandin dê biçilmise û hişk bibe. Ji bo bendavek ku temenê wê 40-50 salan dîroka hezaran salan wêran dike. Gelo dê bi vê veguhastinê çi bi dest bixin? Ji bo 40 salan dîroka hezar salan wêran dikin. Ev ne çareserî ye. Ev der duyemîn cihê Nuh Pêxember e. Ez li van şikeftan ji dayik bûm. Li wir ceyran û av tune bû. Lê em dîsa kêfxweş bûn. Niha vê kefxweşiya me ji destê me digirin. Heskîfê tune dikin. Ger ku em lê xwedî derkevin em dikarin dîsa xelas bikin. Hêj ne dereng e."

Welatî Yaşar Ayhan jî anî ziman ku berê li vir jiyan bêhtir xweş û geş bû û piştî projeya bendavê û guhastina warê dîrokî êdî jiyan li wan herimiye. Ayhan destnîşan kir ku ew berê li vir bêhtir kêfxweş bûn û wiha got: "Berê turîst dihatin vir. Hatina turîstan ji bo debarê baş bû. Îro êdî turîst jî nayên vir. Dîrok tune dibe. Em dixwazin li Heskîfê bijîn û bidin jiyandin."

Xwendekara Zanîngehê ku ji Konyayê hat Heskîfê Aysun Bacak jî anî ziman ku ew ji bo warê dîrokî Heskîfê ziyaret bike hat vir û wiha got: "Cara yekem têm vir. Warê dîrokî yê 12 hezar salan dê di bin bendavê de bê hiştin. Ev ne rast e. Divê dîrok û çand neyê tunekirin. Ev dîroka me ye û divê em tev li vê dîrokê xwedî derkevin."

## Merheba




Hejmara yekê ya Sînemaya Serbixwe hat weşandin ku ew jî weke e-fanzîn derçûye. Di e-fanzîna Sînemaya Serbixwe de wê bi taybetî li sînemayê û bi giştî jî li ser çand û hunerê nivîs, nûçe û zanyarî bên belavkirin.

E-fanzîna bi navê Sînemaya Serbixwe, bi hejmara xwe ya yekê dest bi weşanê kir. Di hejmara yekê de nivîsên li ser sînemaya kurdî û ya cihanê, pirtûkên der barê sînemayê de û hin zanyariyên din hatine weşandin.

Hejmara yekê ji 18 rûpelan pêk tê. Tê de behsa pirtûka Mizgîn Mujde Arslanê tê kirin ku navê wê "Bêwelatî, Sînor û Mirin" e. Pirtûk bi tirkî hatiye weşandin û tê de nirxandinên li ser sînemaya kurdî hene. Edîtor û berpirsê Sînemaya Serbixwe, Rûmet Med Kaya jî ew kes e ku ev nivîs amade kiriye.

Dîsa Mela Mihyedîn bi navê "Efsaneya Selkiyan û fîlmê Ondîne" nivîsek nivîsandiye û behsa Selkiyan dike ku di mîtolojiya Skoç, Îrlandî û Skandinavyayê de lehengekî behrê ye.

Her kî bixwaze, dikare fanzînê wekî PDF'ê daxîne ser kompûtera xwe. ***STENBOL***

## Mîhrîcana Silêmaniyê dibe nûnerê Oskarê



Mîhrîcana Fîlman a Navnatewî ya Silêmaniyê, dibe nûnerê Mîhrîcana Fîlman a Oskarê ya herêmê. Her fîlmek ku di vê mîhrîcanê de weke fîlmê herî baş were hilbijartin, dibe namzet ji bo wergirtina xelata fîlman a Oskarê jî.

Sêyemîn mîhrîcana fîlmên navnetewî ya Silêmaniyê li herêmê bi rê ve çû. 11 jûriyên Oskar beşdarî mîhrîcanê bûn. Di vê mîhrîcanê de (2018) gelek fîlmên baş hatin nîşandan. Ji ber vê Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Silêmaniyê dibe, nûnerê Mîhrîcana Fîlmên Oskar ya herêmê.

Rêveberê Hola Mîhrîcana Fîlman a Navnetewî ya Silêmaniyê Daner Omer jî diyar kir ku kêm maye ku Mîhrîcana Fîlman Navnetewî ya Silêmaniyê gavek maye bibe yek ji mîhrîcanên cîhanî û wiha got: "Ji niha ve weke nûnertiya Oskarê ya herêmê tê dîtin. Ev hêviyeke mezin dide çêkirin ji bo pêşeroja mîhrîcanê û paytexta rewşenbîriyê."

Daner Omer her wiha da xuyakirin ku wateya bûyîna nûnerê Oskarê ew e ku her fîlmekî kurdî yan dokumenterekî di mîhrîcana Silêmaniyê de bibe fîlmê herî baş, rasteraste di Oskarê de pile digre û hêjayî girtina xelatê tê dîtin." ***SILÊMANÎ***